



## Bangawaziya ji bo roja çalakiya navnetewî ya dijî qirkirina jinê!

### *Werin em hevbeş bi rêxistinbûyîna xwe roja 3' ê Tebaxê bikin roja têkoşîna navnetewî ya dijî qirkirina jinê!*

*Di 3' ê Tebaxa 2017' dan de êrişa qirkirinê ya çeteyên DAÎŞê li dijî Kurdên êzîdî yê li Şengalê dikeve sala xwe yê sêyemîn. Êrişên ku di roja 3' ê Tebaxa 2014' dan de hatin destpê kirin ne tenê fermanek mirovî bu di heman demê de armanc ew bu, civaka êzîdî bi bingeşên bidin tune kirin. Ji ber vê jî êriş bi rêkûpêk li dijî jinan hate bikar anîn. Ji lewra di heman demê de qirkirinek jinê jî îfade dike.*

Di 3' ê Tebaxa 2014' dan de raya giştî ya cîhanê bû dîtarê êrişek hovane ku ji aliyê çeteyên DAÎŞ'ê ve bi armanca tunekirina ola herî kevnar ya civaka êzîdî hate pêk anîn. Piştî ku Pêşmergerên PDK (Partiya Demokrat ya Kurdistanê) di wê rojê de bê agahî xwe paş de kişandin û civak li dijî DAÎŞ'ê bê parastin hiştin, civaka êzîdî bi sîstematîk hatin qetil kirin, hatin destavêtin û êşkence kirin, koçber û kole kirin, bi taybetî jin û keçên êzîdî û zarokên xort jî kirin leşker.

Li gorî hejmarên ne fermî ji roja fermanê heyanî niha li Şengalê zêdetirî 5 hezar Jin û Zarok hatin revandin û di bazarên koleyan hatin firotin. Ne tenê li Bakûrê Îraqê û Suriyê van jinan û keçan firotin di heman demê de li dewletên wek Sûûdî Erebaştan bi berdeyamî tîn firotin û wek koleyên zayendî tîn bikar anîn.

Li gorî Netewên Yekbûyî ev êrişa DAÎŞ'ê ya li dijî Êzîdiyan wek Jenosîd/Qirkirin e. Lê ji bo civaka êzîdî ev ferman wek fermana 74' emîn, ya dîroka wan de, tê pênase kirin. Bi vê qirkirina sedsala 21' emîn de bi dijarî fêm kirin ku parastina hebûna wan, Ola wan û Azadiya wan tenê bi vîna xweser, xwe rêxistinbûyîn û xwe parastin gengaz dibe. Bi taybetî jinan di vê pêvajoyê de bi rêxistinbûna xwe ya xweser bersiva qirkirinê û qirkirina jinê didin. Ew êdî nema dixwazin mexdûr bimînin, qedera xwe wek kirde (subje) bi xwe digrin dest û wek Tevgera Azadiya Jinên Êzîdî him li Şengalê û Ewrûpa xwe bi rêxistin dikin.

Xeteriya berdeyamîya qirkirinê hîna jî didome. Hîna jî bi hezaran jinên, keçên u xortên êzîdî di destê DAÎŞ'ê de ne. Pê ve girêdahî jî qirkirina jinê jî bi berdeyamî tê jiyîn. Konferansa navnetewî ya jinên êzîdî di 11' de û 12' de Adara 2017' dan li Bielefeldê bi bîr xist ku ji bo rizgarkirina jinên êzîdî yên di destên DAÎŞ'ê de ne, divê têkoşînek asta navnetewî bê meşandin. Ji lewra jî biryar hate stendin ku roja 3'ê Tebaxê bibe roja navnetewî ya têkoşîna dijî qirkirina jinê.

Qirkirina jinê me hemûyan eleqedar dike. Ji ber qetilkirina sîstematîk ya jinê (ji ber zayenda wê) diyardeyek cîhanî îfade dike û hemû şewazan wek şîdeta fîzîkî, rihî û aborî û dersînorkirina jinê esas digre. Şîdeta zayendperestî jiyana, tendurustiya û mafên bi milyarda jinan di tevahî jiyane dike xeteriyek mezin. Lê wek her car jî qatîlan mîna DAÎŞ û hevkarên wî bê ceza dimînin. Ji ber qirkirina jinê him di mafdariya navnetewî û navxweyî de mîna qirkirina civakê taybet naye dest girtin. Ruxmî ku di nav qirkirina civakê de gelek car şewazên qirkirinên jinan, mînak li Şengalê, tîn jiyîn.

Ji ber vê em bang li jinên cîhanê dikin, 3' ê Tebaxê wek roja navnetewî ya çalakiya li dijî qirkirina jinê bigrin dest û di vê rojê de bi çalakiyên cîhereng balê bixşînin ser rewşa jinên Şengalê yên qetilkirî, dîlgirtî û kolekirî. Tevgera Jina Kurd di vê rojê de him li Kurdistan û dervayê Welat amadekariya çalakiyên şermazarkirinê dikin da ku dengê xwe ji bo Azadiya Jinên êzîdî bilind bikin.

Hûn jî xwe tevî me bikin û ji bo plansaziya çalakiyên hevbeş xwe bigihînin me. Di bajar û welatên xwe çalakiyên xwe pêk bînin. Ji Çalakiyên xwe wêne û dîmenan rê bikin da ku em bi rêya ragihandinên civakî bi jinên êzîdî ra parve bikin û ji nû ve bidin destnîşan kirin ku jinên cîhanê bi wan ra ne.

## PIŞTGIRVAN

### Ji Rojhilata Navîn

- Jinên ji bo Azadî li Iraqê- Women for Peace in Irak
- Saziya Jinên Bagdad- Bagdad Women Association in Irak
- Kongra Star Rojava
- Meclîsa Jinê ya Partiya Demokratîk ya Gelan (HDP)
- Tevgera Azadiya Jinên Kurdistan (RJAK)
- Navenda Jinên Kurd ya Têkiliyên Navnetewî (REPAK) -
- Saziya SARA ya dijî tundiya hemberî jinê li Rojava
- Meclîsa Jinê ya Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) - Rojava
- Platforma dijî tundiya hemberî jinê ya li Bakûrê Kurdistanê
- Tevgera Jinên Azad (TJA)
- Komelgeha Jinên Azad a Rojhilat (KJAR)

### Yên welatên Ewrûpayê

- Saziya Mafên Jinan- Terre des Femmes
- Partiya Femînîstan-JIN
- Tevgera Jinên Afrîkî ya Almanayê Generation ADEFRA
- Sîwana Rêxistinên Biyanî DaMigra e.V.
- Saziya Jinan Courage e.V.
- Saziya Kurdistanî ya Fransa- Association France Kurdistan
- Tevgera Jinên Tamîl- Association Femmes Tamouls
- Kollektîfa Femînîstan ji bo Kobanê- Collectif Feministe Kobane
- Mouvement des Amazigs
- Saziya Hiquqnasên Ermenî- Les Juristes Arméniens
- Meclîsa Rêxistinên Ermenîyan ya Fransa- Conseils des Organisations Arméniens de France
- RONAK-Rêxistina Jinên Rojhilatê Kurdistanê
- Sîwana Meclîsa Jinên Êzîdî e.V.
- Navenda Komalên Êzîdiyan NAV-YÊK e.V.
- Hevgirtina Ciwanên Êzîdî e.V.
- Meclîsa Şengalê ya Dervayê Welat (MŞD) e.V.
- HÊVÎ- Bûroya Perwerdehî û Entegrasyonê
- Nûnertiya Navnetewî ya Tevgera Jinên Kurd
- Yekitiya Jinên Kurdistanî ya Elmanyayê YJK-E e.V.
- Xwendevanên Jin ên Kurdistan (JXX)
- DestDan e.V.
- Tevgera Jinên Kurd ya Ewrûpayê (TJK-E)
- Cenî-Bûroya Aştiya Jinên Kurd
- Federasyona Demokratîk ya Elewîyan (FEDA)

Facebook: Ezidi Jin

E-peyam: ezidi.women.struggle@gmail.com

*Tevgera Azadiya Jinên Êzîdî (TAJÊ)*